# Şeva bi sehim

**W. ji erebî Warihêl sergelî**

Di şeveka havînî ya bê deng da, piştî xwarina şîvê min temaşay filmekê bi sehim kir di têlevzyonê da. Ez di nav rwîdanên wî da gelek helçûm.

Filim bi dumahî hat û ez çûm daku binivim, lê ez bi tinê Mam, dayibabên min û xwîşka min di nivîsitî bûn û ez bo demekê dirêj di vê şevê da Mame hişîyar.

Min guh li dengên tirsnak hebû ku ji layê serdavê ve dihatin. Min divîya bibime qaremanê. Min dest da eletirîka xwe û berev serdavê ve çûm. Min çi nedît û çi nebihîst ji bilî stiranên sîsirrikan. Lê tirsê ez bernedam. Berev beytonê çûm, dîsan min çi nedît, û paşî bi hêmnîve zivirrîme di nav cihê xwe da. Lê dîsan min heman deng bihîst.. Dîsan min dest da eletirîka xwe û çûme di serdavê ve û min çi nedît, lê demê ez çûyme beytonê û min eletirîka xwe êxisitî ye wî cihê min guman liser hey, min dît pişîka min serê xwe yê di nav wî amîrê muzîkê ra asê kirî yê ku min spêdê çêkirî.

